

Kongirê Birûksilê - (24) Rêxistinên Sûrî daxwaz dikin ku zimanê Kurdî di Kongirên Birûksilê de berdest be



***Kongirê Birûksilê - (24) Rêxistinên Sûrî daxwaz
dikin ku zimanê Kurdî di Kongirên Birûksilê de
berdest be***

*Axaftin û hevghiştin bi zimanê dayikê, yek ji mafên mirov ên
sereke ye, çî kes û çî kom bin, û divê ku bê rêzgirtin, û rê li pêş
beşdarbûyan bê vekirin ku hest û gotarên xwe bi zimanê xwe
vebêjin*

Ji sala 2017an ve, û di bin navê "Kongirê Birûksilê" de, bi dehan şande û kesayetî, ji nûnerên desthilatanên têkildarî doseya Sûriyê, û destyên navneteweyî, saziyên navdewletî, û rêxistinên civaka sivil ên Sûrî, li "Brûksilê" paytexta Belcîkayê dicivin. Ev komcivîn bi awayekî salane, bi armanca serhevdan û komkirina alîkariyên mirovahî bo Sûriyê û herêmê tê lidarxistin, her ji bo sivikirina krîzê li Sûriyê û welatên hawirdorê.

Ev kongir bi armanca piştevaniya Sûriyê û xelkên wê tê lidarxistin, lewma çî gav ber bi nîşankirina pirrengîya Sûriyê, dê nameyên erênî bo tevahiya Sûriyan bişîne, ku Yekîtiya Ewropayê û Desthilat û Rêxistinên ku tevî kongirê dibin, piştgiriya pirrengîya zimanî û çandî li Sûriyê dikin, û dehsalên ji paşguhkirin û tunekirinê çûn, û nema vedigerin.

Her ji bo avakirina pêşerojekê ku mafên tevahiya Sûriyan tê de parastî û wekhev bin. Rêxistinên ku li ser vê nameyê îmze kirine dibînin ku girînge tevahîya nûnerên xelkên Sûriyê, çî kes û çî kom bin, di pirojeyêke wiha de, ku pêşeroja wan gengeşe dike, bi zimanê xwe yê dayikê beşdar bibin, nemaze ew komên ku di heyama dehsalên berê ji temenê Sûriyê û herêmê de, rastî zordariyê hatine.

Ev gav dê lihevhatî be bi naveroka danûstendinên berfireh ên ku Yekîtiya Ewropayê bi rêxistinê Sûrî re derbarê piştgiriya cûrecûrbûn û pirrengîyê li Sûriyê li dar dixê, û dê wek şeweyêke piştgirî û piştevaniyê bo armancên destpêşxiriyên Sûrî, bê derbrîn.

Herwiha ji bo bi cî anîna armancên çavrêkirî ji Kongirên hevpeyvînî yê wiha bi awayekî dadmend û herdemî, divê ku ew beşdarbûn rasteqîne û xweyî wate be, û danûstendin û gotarên taybet bi beşdarbûyan bi zimanê wan ê dayikê be, çî ku dê ev yek hest bide wan ku ew beşekî rasteqîne ne ji her gavekê yan çareserîyekê ku tê gengeşe kirin.

Axaftin û hevghiştin bi zimanê dayikê, yek ji mafên mirov ên sereke ye, çî kes û çî kom bin, û divê ku bê rêzgirtin, û rê li pêş beşdarbûyan bê vekirin ku hest û gotarên xwe bi zimanê xwe vebêjin.

Lewma, Rêxistinên ku li ser vê nameyê îmze kirine, ji birêveberên Kongirê Brûksilê yê şeşemîn 2022 dixwazin ku gavin birêkûpêk bavêjin ji bo berdestkirina zimanê Kurdî, wekî zimanekî sereke di tevahîya qonaxên Kongirê de, û tevahiya çalakiyên tîn, yê girêdayî Sûriyê.

Rêxistinên îmzekar:

1. Afrin Platform
2. Analysis and strategic studies organization
3. Aso News Network
4. Center for research and protection of women's rights in Syria
5. DemoS
6. DeveopmenSeedsCenter
7. Dijla Organization for Development and Environment
8. Ezdina Organization
9. FDO
10. Hevdestî-Synergy for the Victims in North and East Syria
11. Human rights organizations Afrin- Syria
12. Jiyan Foundation for human rights

13. Kurds without borders
14. Nudem for Humanitarian Development and Rehabilitation of Persons With Disabilities organizes
15. PÊL- Civil Waves
16. Ras Al Ein (serê kaniyê) Platform
17. Sara Organization to Combat Violence against Women
18. Scsd
19. shams organisation
20. Shawshka Women's Association
21. Syrians for Truth and Justice - STJ
22. TEVIN
23. West Kurdistan Intellectuals Union
24. Wheate & Olive Platform